



Welat

Efrîn...
soza zeytûnan



Her kes bi kurdî dizane

Aras Yûsiv

2

Gelek caran dema rojname an pirtûkek kurdî diket nav destên me de , tenê li wêneyan dihat nerîn , herî zêde navnîşanê nivîsaran dihatin xwendin, dûvre hêdî hêdî ew rojname an pirtûk didan alî û gotina “Yaw ez bi kurdî nizanîm” dihat gotin, belê dema ku gotinê gotin dikişand her yekî ji hevalan behsa kesekî nêzîkî xwe dikir ku ew bi kurdî dizane bixwîne û binivîsîne , hevdem wek pêşbaziyeke biçûk ji çêdibû ka kî dizane navê filan tiştî bi kurdî.

Ev hemû li aliyekî û mijara temaşekirina tevelizyonên kurdî li aliyekî din ku piraniya xelkên herêmên me yên kurdî li sûriyê digotin: “Em tişteki ji van kenalan fêhm nakin” weku ew televizyon yê miltekî biyanî bin û ne kurdî bin.

Kelemeke mezin di nav gelê kurd û zimanê wî yê petî de hebû û herdem hewlên biçûk yê fêrkirina zimanê kurdî çî li ser astên teng an mezin hebûn tevî ku ji ber fêrkirina ziman gelek mamosteyên ziman kurdî dihatin girtin, lê hewl û kors qut nedibûn.

Îro û piştî bêtirî 3 salan li ser temenê şoreşa sûrî gelek tişt hatin guhertin , herî kêrî îro gotinên kurdî êdî dikevin nav civakê de û gelek gotinên ku berê nedihatîn fêmkirin êdî têne fêmkirin, û ev yek nîşaneke xêrê ye ku zimanê kurdî li sûriyê bi xêr e .

Helbet dema ku em dibêjin zimanê me yê kurdî ji zimanekî biyanî vegeriya zimanê kolanê û derbasî civakê dibe, ev yek ji ber ku sînor di nav me û zimanê me

Kovara **WELAT**
Çandî- Giştî- Nîvmehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Îmad Talatî
Xweşnav Heso

Dizayner:
Hesen Berzencî

Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welat.press@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



yê petî de rabûne û şagirt ji rêza pêşî dikarin fêrî zimanê xwe bibin .

Gengaze ku nêzîk ew roj bi ser kurdên sûriyê de were ku ne gelek an piraniyan wan lê tevahiya wan bi kurdî bizanibin bixwînin û binivîsînin ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution

Çenteyê Koçbûnê

Pîştî ku min karê xwe li saziya ciyolocya bidawî kir, ew saziya ku li taxa Hoş Elbaîr dikeve, ez daketim bazarê li navenda bajarê Heseke, li ser rêka serekî a ku di nîvê taxa Xiwêran de diçe ez bi metirsî dimeşiyam, çimkî ew pirtirîn tax e ji taxên Heseke ku şerên çekdarî lê çêbûne, herweha gellek kesên sivil li ser wê rêkê birîndar bûne û jiyana xwe ji dest dane, lê naçar min da ser wê rêkê jiber ku rêka din a ku di taxa Neşwa re diçe pir dûr e.

Bazara cil û kelûpelên gundiyan li nîvê bajarê Heseke dikeve û ji pîrbûna mirovan merov bi zehmetî têde dimeşe, nemaze ew cada ku dikana bavê Hozan têde bû tevgera pir çalak lê hebû, hevalê min bavê Hozan bazirganekî kevnare ye, çente û kincên gundiyan difroşe, herweha cilên pembo yê hundi, piştî ku silava min vegeand du kursiyên biçûk anîn û em li ser wan rûniştin, wek adeta xwe çaydanek çayê ji çayxanê bo min xwest, û me pîrsa rewşa hev kir, bavê Hozan digote min ku tevgera bazarê pir qels bûye, ne wekî dema berî şoreşê ye, tişt buha bûne û nîrxê lîra sûrî di asteke pir nizim de derbas dibe beramberî dolarê Emrîkî, di heman demê de jibîr nake ku diyardeya koçbûna mîletê vî bajarî bandoreke neyînî li ser tevgera kîrîn û firotinê dike, lê tenê tiştê bi piranî tê firotin ew çente ne, min bi çavê xwe jî didît ku kesê tî dikanê tenê pîrsa çenteyan dikin û tenê çente tî firotin, gellik kes hatin pîrsa çenta dikirin ji wan mîr û jin û genc, bavê Hozan jî bersiva wan dida û buhayê çenteyan ji wan re digot (1500, 1000, 800, 500, 300..... lîre Sûrî) her çenteyek buhayê wî yê



taybet hebû, hineka dikrî û hinin dîtir nedikrî û diçûn dikanên din bi merema ku çenteyekî erzantir bibînin ku buhayê wî gunçaw be ligor rewşa aborî ya diyarê ku şîniyên vî bajarî tê re derbas dibin.

Bavê Hozan ji wan kesan dipirsî liser sedemên koçbûnê, lê bersivên wan hema yek bûn, ne tenê jiber rewşa ewlehî ya netebût, disere rewşa aborî pir zehmet bûye û derfetên kar li pêşiya mirov kêm bûne û jiyan pir dijwar bûye li vî bajarî jiber nebûna karebê û telefonan û kêmbûna avê û nan û gazê, û buhabûna pêdiviyên jiyana rojane bêsînor, ev sedem tevde dihelîn ku çente tenê ji dikana bavê Hozan bî firotin, ew ji sipîdeyê ta êvarî nêzîkî neh deh çenteyan difroşe, bi pîrbûna diyardeya koçbûnê rûwê mirovên vî bajarî roj bi roj tî guhertin û rûwin din dikevin şûna wan, ta radeyekê ku em hest dikin em bûne mirovin biyan li bajarê xwe.

Salar Salih



Bîranên rozameyeke kurdî

Sala 1995 sê sed saliya Ehme dê Xanê bû ji lwere min xwest ez rozmanekî 365 wek yê Erebi lê belê tev bi bi zimanê kurdî û tîpên latînî û li gor yên ku li Sûrî bi zimanê Erebi der diçûn. Min xwest em ku ez wî karê piçûk diyarî Ehmedê Xanê bikim di sê sed saliya wiya pîroz de. Ji ber ku ew ji min dihat û di wê demê de her komek folklorî ji komên partiya rojnamk beriya Newrozê derdixistin û li millet bela dikir lê ew bihtir ji bo ku alîkariya wan koma were kirin bi nexê wan rojnamê ku ya herî baş 12 pel bûn. Lê min xwest ez tiştê nû çêbikim û ew bibe weka dibistanek piçûk û derbasî her malê bibe ji ber ku zimanê me qedexbû lê heger ku ew rojname derbasî piraniya malê kurdan bibin dibê ku hinekî ji wan kêmasiyê em dagirin û di rêya wê re hin kesê me fêrî zimanê xwe yê zikmakî bibin.

Ji lewe re jî min xwest ku tiştê ji min werê ji dîrok helbest şoreş di wê rojnamê de binvîsin. Û min ew bi vî rengî çêkir li gor zanîna xwe. di binê palê de tiştê ku di wê rojê de hatî serê kurda û heger ku tiştê kurdî di wê rojê de neba min yeka li ser asta cîhanî dinvîsand. Û li piştê pelê jî pendê kurdî û parçe ji helbestê kurdî û serbûrî û serpêhatî û parçe ji dîroka kurdî û bi taybet hemî şoreş û serhildanê ku di ber Azadiya Kurdistanê de serî li ber dijmin hildane.

Bi kinayî min di wê demê de didît ku ew rojname dibistanek piçûk e û heger ku em karibin wê çêbikin û derbasî her mala kurd bikin wê karek pir başbe û bi kêmasî wê hin ji milletê me fêrî zimanê xwe bibe. Lê dema ku min dest bi wî karî kir û min zanî ta ku armanca min pêk werê bi min tenê ew kar naçê serî ji lwe re piştî ku min rojnama amadekir min ji komê folklorî yên ku rojname ji sê pala yan şeş pela û ya herî gelek 12 pel bûn re got va min karek wisa kiriye ka werin emê li ser navekî li hev bikin û bila ew rojname bibe ya me teva û emê çapbikin û her komek ka salê çend rojname ji xwe çê dikirin ji komê rakîn û bi vî rengî wê ew dibistana piçûk der basî piraniya malê kurdî bibe. Lê mixabin kesî ji komê me yên folklorî nikarin dev ji navê rojnama ku bi navê koma xwe çêdikirin berdin û ji xwe her komek ya partiyekî bû. li gor dîtin min ku ew kurd nikarin tiştê hev beş bikin û her yek ji me di xwazê ku ew hebe û ji bilî wî kes nebe. Min bi tena xwe ew rojname



sê salî çêkir û ji ber ku min ji sê sed saliya Ehmedê xanê dest pêkir min navê wê kir rojnama Xanî. Lê piştî sê sala min jî ew sekinand ji ber ez wê çaxê hevalê partiya Çepê kurd li Sûriya bûm û nêrxê çapê partiyê di dan lê ew perê ku partiyê didan lê venedigeran rabû ji min re gotin em jî nema rojnama bi vî rengî derdixin. Û ew rojnama Xanî bi wî rengê xwe yê bedew û ji sê sala pêve der neket..

Luqman Silêman



Destê tenê deng jê nayê

Di zargotina kurdî de gelek pend û metelok hene, yekîtiyê, hevgirtinê û hevkarîyê biha dinexînîn, û hestan ber bi vê semtê de gur dîkin. Ev pend jî di wî warî de ye, weha diçe, ku mirov bi tenha, her çiqas hêzdar û çalak be jî, nikare bi karên hukardar rabe, eger kanibe jî, wê dengvedana wan karan ne wek ya karên komel be. wek çawa deng ji destekî bi tenha nayê.

Lê bi bawerîya min wateya vê pendê li ba vê yekê bi dawî nabe, belê bi ser de mirov dihurhutîne, da têkeve nav xebat û karên komel, çalakiya wî dê wê hingê berhemdar sûdar bibe.

Zargotin bi gelemperî û pend bi taybetî gencîneya çanda mîlet e, û dengvedana serpêhatiyên wî ye, pê re jî ev pend dengvedana helwesta civaka kurdî ye li hember rewş û pergala perçebûn û dabeşkirina hêza wê, û ji bo yekbûna wê hêzê banga dilsoz e.

Pendiyarê, ku ev pend bi şûn xwe de hêştî, serkêşê ramana netewî kurdî, helbestvanê gewre; Ehmedê Xanî, tîne

bîriya me; ewê, ku beriya bêtirî sê sed sal, yekbûna vî mîletî dipeland:


Ger dê hebûya me îtîfaqek
Vêkra bikira me înqiyadek
Tekmîl dikir me dîn û dewlet
Tehsîl dikir me îlm û hîkmet.

Ehmedê Xanî, bi vê gotina xwe, hem yekbûnê û hevgirtinê biha dinexînê, û hem jî yekbûnê û hevgirtinê yekemîn mercên avakirina dewletekê, û bidestxisina zanîne dibîne.

Eger mîletê Kurd, di navbera vê gotin û boçûna Xanî re, rewşa xwe bimeyzînê, dê pê hay bibe, ku ne tenê dijminan sitemkarî li wan kirine, belê wan jî bi xwe sitemkarî li xwe kirine, û dê nîrxê vê penda, ku mijara me ye, nas bike.

Lê her çiqasî boçûna Xanî şûngirtî û rast e jî, nikare bibe pend, ji ber ku rola hevgirtinê li ba avakirina dewletê tewaw dibe, lê rol û bandora pendê her tim li ser kar e, çumkê giringtirîn taybetiya pêndê ew e, ku pend her tim bi demê re li rê ye, û erdnîgariyan û sînoran derbas dike.

Vêca mirov dikare weha biçe, ku hêzên gelê me îro di vê dema şoreşa gelê Sûriyê de hewcedar in, ku guhên xwe bidin vê penda, ku wateya wê li gel rewşa me di van nîrên dijwar û nazik, têkildar e.

**Heyder Omer****5**

Kompaniyeke elektrîkê ya nû li Amûdê dest bi kar dike

Efsanê Amûdê

Li Amûdê birîna êlêktrîka dewletê ji ber şer û pevçûnên li sûrî û pêdiviya dabinkirina elêktrîkê di havînê de bû sedem ku hin kompaniyên taybet ava bibin

Ji bilî kompaniya ronak niha kompaniyeke nû dest bikar dike bi navê kompaniya Orkêş, ev kompanî kompaniyeke kesaneke niha li Amûdê dixebite bi danîna motoran û alavên wê.

kompaniya Orkêş niha haziriya motorekî dike û ev motor dê karîbe elêktrîka bigihîne 150 malî, her malek çar empêr dikare bikşîne û her empêrek bi 750 lereyên sûrî ye, hevdem Orkêş hewil dide ku motorên din li hin taxên dîtir deyne, û bo dema dayina elêktrîkê, dê li ser du beşn were danîn, beşekî danê nîvro û beşek êvarê.

Tevî ku Amûdê îro hino hino bi temamî

ronî dibe lê hin malbat hene nikarin ku elêktrîka kompaniyên taybet bikşînin ji ber rewşa wanî aborî ya xerab dimînin di tariyê de û li benda guhertina rewşê û dilovanîyê ne ■



Dema ku mirov di welatê xwe de penaber dibe!!

Mihemed Alûcî

Gelek kes, dema ku peyva (penaber) dibihîzin, yekser bala wan diçe ser, koçkirinê bo dervey welat.

Lê îro li Sûryê, wateyeke din ji penaberiye re heye (penaberî di welat de), gelek kes hene ku di hundirê welatê de penaber bûne, û êş

û azarên ku ew dikşînin ji yên ku koçberî dervey welat bûne kûrtir, û diwart irin.

Pir bi azare dema ku mirov di welatê xwe de, hest bi windabûn, û biyaniyê dike.

Gelek bi êşe, dema ku mirov dest ji mala xwe berdide, û hemû, bîranînên xweş û nexweş li paş xwe ve dihêle û ji warê xwe bar dike, belkî ew sînoran derbas nake, û di bin çadîran de namîne, lê her ew dimîne Penaber. di dilê wan de gelek gilî, û gazin peyda dibin, lê tu kes dengê dilê wan nabhîze, lewma ew jî destê xwe datînin ser dilê xwe, û bi bêdengî derd, û birînen xwe di nava xwe de dihêlin.

Çîrokên meşextiyê li vî welatî pir bûne, gelek kes bê cîh û war mane, bê hêvî û omîd mane li kolanan. gepa nanê xwe dipûrisînin, û bê deng rûbirûy çarenivîsa xwe yî reş

dibin.

Lê kesên ku baceya herî mezin didin di vî tracîdya mirovî de (zarokin).

Jimareyek mezin ji zarokên Sûryê, sêwî û bê xwedî li kolanan mane.

Aya kiçeke 10 salî ye, piştî ku mala wê li Humsê hat wêran kirin, û bavê wê û du birayên wê têde hatin kuştin, ew û dayka xwe, û birayê xwe yî biçûk ji ber mirinê revîyan, û îro ew li bajarê Amûdê, di dibistaneke çolkirî de, bi cîh bûne, belkî ev dibistan ji mala wan mezin tir be, lê tu car tîna wê nabe wek tîna mala wanî biçûk.

di rewşeke pir xerab de dijîn, û alîkariyên ku ji wanre tên ne li gorî pêwîstiyên wane.

Dema ku me xwest em nêzîkayê li Aya bikin, û pêre baxivin, wê bi rondikan bersiva me da, û ji mere got: ez gelek bêzarim li vî derê..

Min bêrya bavê xwe kiriye.. min bêriya mala xwe, û zarokên taxa xwe kiriye.. ez dixwazim vegerim malê, lê ez ji mirinê ditirsim ... ji bermîlên agir ditirsim.

Dayka Aya dibêje: her çendî em bê omîd mane ji çareseriyê, lê dîsan di dilê min de piçek hêvî heye ku aştî careke din vegere welatê me,

û ez û zarokên xwe vegerin bajarê xwe, û ji nû ve em kevrên mala xwe bidin ser hev, û perçeyekî ji jiyana xwe yî Kevin vegerînin.

Çîrokên mîna çîroka Aya û malbata wê pirin li vî welatî, û tenê du bijarde li ber penaberên welat hene, yan ewê vegerin cîhê xwe û rûbirûy bermîlên mirinê bibin, yan jî ewê bimînin penaber, ku ew jî wateyek din ji mirinê re ye.. mirina hestan, mirina hêvî û awatan ■

Dirbêsiyê û nexweşiya Laşmanya

Se'dûn Al Sîno

Nexweşiya Laşmanya an jî wek tê naskirin bi Kurdî – Heba Helebê- êdî belav dibe ji vedana mêşek pir biçûk, ew mêş bi zehmetiyekê bi çavan tê dîtin , û ji wê re dibêjin mesa qûmê , ev mêş ew sedeme ji vê nexweşiyê re, nexweşiya Laşmanya li ser çerm şopê xwe diyar dike, û êdî hin bi hin çerm belek dibe heger zû bi zû derman nebe.

Û carnan mesa Laşmanya ziyaneke bêtir dike , ku dighêja ziyana nava mirov, û zik û hinavan de jî, eger ew mêş bi mişkan yan bi kûçikanên ku bi nexweşiya Laşmanya bin vede, wê gavê mêş jî bi Laşmanya dikeve, û dibe sedem bi pêketina mirovan jî.

Herêma Kurdî gelek caran di vê demê de ji vê nexweşiyê gazincan dike, di Dirbêsiyê de tenê, bêtirî 200 kesan bi vê nexweşiyê ketine ji destpêka şoreşa Sûryê ve, û ev jî ji gelek sedemaye , jê: Li paşketina agehdariya tenduristî li paqijiyê navçeyan û şerên ku berdewam dikin li herêmê, ya ku hişt gelek term û laş belav bibin li derdora bajaran, tevî kêmasiya dermanan bo ku bibe sînor li himber belavkirina van nexweşiyên.

Û di nav hevgotinên Welat bi dr. Taha Erebo re , yek ji pîjîşkên çerm li bajarê Dirbêsiyê, wilo axivî û got :



Me gelek nexweşiyên giran pêşwazî kir yê ku çermên wan hêrîfî bû, di laş û nigan de, û nexweşî gihîştibû astek ziyan û bivîn, û pîjîşkên Dirbêsiyê ji hêla xwe vegazina kêmasiya dermanan dikin bo vê vê nexweşiyê.

Ji hêlek din ve, diyare ku belavbûna gemarê li dora bajêr ew jî sedemeke ji vê belavbûnê re, û dr. Mûsa Hesên , wî jî wisa got :

Rewşa tenduristî li paşê di herêma Kurdî de bi tevayî, û kêmasiya dermanan û tunebûna agehdariya berpirsyar cihên metirsîyê ne bo pêşerojê di herêma Kurdî de , û ev rewş divê ku li ser wê were rawstandin, ji layê rêxistinên tenduristî yê herêmî û navdewletî ta ku çarake ji vê rewşa aloz û têkçûyî re bibînin ■

Heyva Sor a Kurd şaxekî xwe li Tirbespiyê vedike

Silêman Ehmed

Piştî demeke dirêj ji hewldanan Heyva Sor a kurd navenda xwe li bajarê Tirbespiyê vedike û ev gav tê di nav hewldanên başkirina rewşa tenduristî li herêmê ya ku ji berê ve rastî gelek zehmetiyan ji aliyê rêjîma Esed dihat.

Li gora rêvebirên vê navendê gelek zehmetî ketin pêşiya wan ta wan dikaribû vê navendê vekin lê ew hêvî dikin ku di demên bê de bikar bin van zehmetiyan derbas bikin .

Heyva Sor a Kurd li Tirbespiyê wek plan daniye pêşiya xwe ku ew alîkariya astengdaran bike û bo vê yekê ew têkevin nav têkiliyan bi sazî û rêxistinên tenduristî yê navnetewî.

Hevdem şaxê Heyva Sor a Kurd radighîne ku ew ê alîkariya penaber û belengazan di peydakirina dermanan de bike.

Aniha li navendê gelek cureyên dermanan peyda dibin lê hîn derman bo hin nexweşiyên din yê giran peyda nabin û hewl peydakirina wê dibin ■



Salihê Heydo... kaniyek folklorê Kurdî

Raman Îsa

Wek em tev dizanin , nasnama miletekî , ewe ku çand,kultûr û folklorê wî miletî zengîn û berdest be. ji ber ku çi milete di cîhanê de dijî dîrokeke wî heye,nexasim miletê kurd di baweriya min de zengîntirîn milete , bi çand ,dîrok û folklor ê xwe yê resen.

gelek rewşenbîr û nivîskaran li ser foloklorê kurdî nivîsandine

yek ji wan Mamosta Nivîskar , lêkolîner, helbestvan û foloklornas Salihê Heydo

Salihê Heydo di 6 ê meha adara sala 1956 an de li gundê Hesê Ûso ji dayik bûye, xwendina xwe ya navendî li wir kiriye ,Salihê Heydo ji biçûkaniya xwe guh daye , ziman , çand û folklorê kurdî û têde bûye weke lêvegerk .

Ji berhemên wî yên çapkirî :

- 1- kêferat dîwana 1 ê yekê helbest 1985.
- 2- Serpêhatiya perîşan û Memê şivan (destane) 1985
- 3- Birîna kûr dîwana (2)an 1988.
- 4- Serpêhatiya Tûmazê kildanî û axayê şêrwanî hemî çîrok û serpêhatiyên jîwarîne 1996.
- 5- Evîna welêt dîwana (3)an 1997
- Ronîkirinik li ser karên wî yên dîtir.
- 1-2000 dîrok û stranên folklorî berevkirine û hemî şirove kirine bûyer , tarîx , cih û warên wan daye nîşandan.
- 2-500 çîrokên gelêrî bi awayê hebû tunebû nivîsandiye.
- 3-4000 metelok û derbirîn û pendên pêşiya ji wînda bûnê paristine û nivîsîne tev şirovekirinê.
- 4-300 mamikên têderxistinok di gel 500 hejmarok û zûbêjiyên zarokên kurd.
- 5-50 dîrokên zarokan û sirûdên folklorî.
- 6-200 qelîbotik û pêkenokên kurdî yên gelêrî.
- 7-7000 wêne (sûret) yên keç û jinên kurdan bi kinc û cil û berg û girêdana wanî resen û rengîn yên her herêmê û e'şîrê digel yê zilaman.
- 8-90 CD sîdî tomarkirine bi deng û reng digel keç û jinên kurd yê her deverê bi dîrok û awazên wan yê folklorî bi awayê lêvegerzndina keç û jinan weke koral û kewres hemî yê paleyê , qirşvaniyê , destarhêrkê , dankutê , dewkilanê , bêrîvaniyê , kirîvantiyê , hêlan û dergûşan , savar kelîne , bêlûte , hûrizî yê ser bûk û zavan , qeyd cirîda hespan , û hemû dîrikên ku di kar û barên kurdan yê jîyanê de digel alav û daçekên wan hatine parastin.
- 9-çar dîwanên neçap kirî.
- ji bilî helbestan û berevkirina folklor û bend û mijarên ku li ser zimanê kurdî nivîsandine zane li piraniya anstromant û pêwengên kurdî bixîne weke tembûr , Ûd , cimbiş , org ,û bilûr .

10-56 pirtûk û derpêçên wî yên neçapkirî hene.



di hevdîtineke taybet de jibo kovara welat Heydo wiha ragihand

Derbarê pîrsa ku çi armancên wî di danheva folklorê kurdî de heye? Heydo dibêje bi demên dirêj dever bi dever ez geriyame ji bo danheva filoklorê kurdî,da ku ez bikim dokyomenter ji ber folklor nasnama milet e û ev ji erkê me yê herî pîroz e , û ev ji her kesê rewşenbîr û civaknas tê xwestin

Salih Heydo herweha got: Tevî ku folklorê kurdî ji sedê salan ve hatiye tunekirin ji gelek aliyên ve lê hîn ez dibînim ku mayê mîna kelemekê,ez dixwazim mînakekê bibêjim, folklornasê elmanî Albêrt Sotsin di sala 1780ê de hatiye kurdistanê,û gelek ji folklorê kurdan daye hev,û gotiye ew zengîntirîng folklor di cîhanê de ye ,

nemûneya din ew e ku tirkên dema ku dixwestin miletê kurd tune bikin,digotin pir hêsane çawisandina wan lê tenê foloklorê vî miletî maye wek kelemekî li pêş me.

Salih Heydo û piştî ked û xebata dirêj di ber folklorê kurdî de ji nîfşê nû dixwaze ku ew xwedî li vî folklorî derkeve: Ez dibînim ku min ne xizmeta xwe kiriyê di danheva folklor de , lê min xizmeta meltekî kiriyê ku ji sedê salan ve hatiye tunekirin, ez pir kêfxweşim ku min dîroka miletê xwe radestî xort û keçên nûhatî kiriyê

di dawiyê de ez banga xwe dişînim ji xort û keçên bê re , ku ew li ziman ,dîrok ,filoklor , û welatê xwe xwedî derkevin ■

Havîna Serê Kaniyê

Xalid şêxo

Wek tê zanîn ku demsala Havînê bêhtirî demsalên din di hêla peydabûn û belavkirina nexweşîyan de. ew nesaxî û nexweşîyan ku divêtin mirov li ser wan raweste û bo ziyarên wan agahdarbe, erke li ser mirov ku baldariyê bo saxlemiya xwe bike û xwe baş biparêze , çî li ser hêla laş û paqijiyê be , û çî li ser ziyana ku dighêje çandiniyê û surîştê li wê çarçovê.

Bajarê Serê Kaniyê ji berî van çend salên borî de,gelek zehmetî û alozî kişand, ji hêla xizmeta taxan û mirovan , û tevî keda Encumena Şaredariyê, ku bi karê xwe radibe li gorî pêdawistên nadar û kêr , lê ta vê gavê jî bi dawî kirina vî karî hêj nebûye, û paşvexistina gelek nexweşîyan hîn jî çareser nebûye .

Ev tişt ne tenê girêdayê Encumena Şaredariyê ye, belê ew erke û pêwiste li ser milê hemû welatîyên bajêr bi temamî , û gereke ku pêdawistên paqijiyê peyda bibe, da ku sînorekî ji belavbûna van nexweşîyan re were danîn .

Û bo rawestan û hûrbûnîya li ser vê babeta giring (Welat) bi dr.Mustefa Kinco re hevdişînek taybet li dar xist, dr. Kinco endame di Encumana Tenduristî li Serê Kaniyê , dr. Kinco bo Welat wisa axivî û got :

« Ez li vî bajarî karê nojdariyê dikim ji berî bêtirî 25 salan ve ,gelek nexweşî peyda bûne û belav dibin , di vê herêmê de , belkî gelek kes bi

navên van nexweşîyan jî nizanin , lê di dema dawî de ev nexweşî belav bûn bi şeweyeke ber fireh ji gelek sedeman, ji ber veguheza gelek kesên biyan ji parêzgehan bo vê herêmê , dibe ku hin ji wan kesan ev nexweşî di wan de peydabû berî ku werin , wek nexweşîya Heba Salê, û mixabin pir ji van nexweşîyan di riya bihndanê di nav mirovan de belav dibe, an jî di riya kelmêşan de, nemaze ku di Havînê de kelmêş li xwe bêhtir dibin û bivîniya wan jî bo veguhestina nexweşîyan bêhtir dibe.

Hin cureyên van nexweşîyan:

1-Zerik

2-Navçûn, ev jî ji ber gemarbûna av û goşt û şînkayên der dora bajêr

3-Leşmánya-Heba Salê- , ya ku di riya kelmêşan û veguhestinên komên mirovan çêdibe.» .

Û li ser rêka xwe parastinê, ji van nexweşîyan dr. Kinco wilo tekez kir « baldarî li paqijiyê û zuha kirina çiravên li dora bajêr , û karanîna dermanan bo qirkirina wan kelmêşên nexweşî veguhez.

2-dûrxistina gemar û sergo ji kenarê bajêr, ji ber ku divê cihê avêjtina gemarê bi gelekî dûrî bajêr be.

3-peydakirina dermanan, bi taybetî bo vê demsalê.

4-agehdarî û pirskirina şaredariyê li firoşxaneyên şînkayî û goşt firoşan» .

-Mustefa Zeyîm, welatiek ji Serê Kaniyê ye , ji Welat re wilo axivî û şîrove kir :

« berdewamiya birrîna eliktirîkê û kêmasiya wê ,pêdiviyên welatîyan bi cih nayne, û ev tişt bandorek ziyar di jiyana rojane de dike, çî ji hêla tenduristiyê û çî ji hêla laş û pemeyinan de, ew pemeyinên ku zû êdî tene avêjtin, nemaze şînkayî , û ev jî sedemeke di ziyana diravî de. tişteki din ku girêdayê nebûna eliktirîkê, têt çûna amûreyên eliktirîkî, ji ber dan û stendina vê eliktirîkê « ■



Kampa Hekmîyê, devereke ewlehiyê li welatekî ku dişewite..

Fener Ehmed

7 kîlometran rojhilatî bajarê Dêrikê, nêzî gundê Hikmiye, kampeke bo penaberên sûrî hate vekirin. karûbarên amadehiyê bo kampê berdewam in, û aniha ev kamp dikare pêşwaziya penaberan bike. wisa, çend malbat jî li kampê bicih bûne. Di hevpeyvînekê de bi birêz Dijwar Ehmed re (serokê komîteya karûbarên kar di hikûmeta kantona Cizîrê de), birêz Ehmed danezan kir, ku 50 konên dijber bi hemî mercên xwezayîyê re amade ne ta aniha, û em ê nêzî 300 konên din jî amade bikin wekî gaveke seretayî, û em ê bikaribin hemî xwestek û pêdiviyên bingehîn, herwiha parastinê jî penaberan re peyda bikin, û ev gav, pêdivîyeke girîng bû bo me, da ku em bikaribin çareseriyê jî penaberan re bibînin li bajarên me yên ewlê".

Di heman mijarê de, Dijwar Ehmed destnîşan kir, ku ev kon jî

hêla Heyva Sor a Kurdistanê hatine pêşkêşkirin,

Wisa jî, gelek soz jî rêxistinên navdewletî standine bo alîkariyê wekî (Bizîşkên bêsînor- UNHCR- ARD- ARS- Bernameya cihanî ya xwarinê). Di danûstanên me de bi hin penaberan re, anîn ziman ku ew li vê kampê parastî ne, piştî ew rewşacdiwar ku derbas kirin, ji bombebaranê, ta bi teqîn, bermîl û şerpezebûnê. Di heman demê de razîbûna xwe nîşan dan li ser danûstana rêvebirîya kampê bi wan re.

Fatima Elî, ku ji kampa Yermûk hatiye, dibêje: topbaraneke giran li me hat, û mêrê min di encamê de birîndar bû, ji ber wê jî em revîyan taxa Ceremana, û ji wir em hatin sînorê Sûrya- Iraqê (Sêmalika) bo



dermankirinê li Kurdistanê Iraqê lê, Dergeh girtiye, û ev kamp jî cihekî aram e em dikarin lê bijîn, li hêviya dermankirina mêrê min.

Hesen Ebo, ku ji gundewarê Helebê hatiye, dibêje: piştî êrîşên daiş`ê, em ji gundê xwe revîyan, û bêpenah man, wilo me xwest ku li Herêma Kurdistanê bicih bibin, û em li gundê Şirikê du mehan man li benda vekirina deriyê Sêmalika, lê, piştî vekirina vê kampê em hatin vir..

Êşa mîletê Sûriyê hîn berdewam e, û bi situxwariya civaka navdewletî vî mîletî biryara xwe dabû ku ew bi xwe ji xwe re piştgir be, da jiyana xwe berdewam bike û riyên hêviyê li pêş xwe herdem biaferîne.

Nanê cotkaran di metirsiyê de ye

Gulal liyanî

Cotkarî karekî serekiye ji bo hemû welatî û niştecihên herêma Girkê legê re, çandinî cihekî girîng û mezin di rewşa abûrî ya herêmê de xwe digre, lê tevî girîngiya cotkariyê û girêdana piraniya welatiya bi vî karî ve, cotkar her sal beranbarî gelek zehmatîyan de radiwestin, ji roja çandinîyê ta bi çinîyê.

Lê di vê salê de astengiyên din li pêş cotkar peydabû wek kêmanî û buhabûna semada buharî û dermanên bela û nexweşiyên çandinê

herweha cotkarî jî gundewarê Girkê legê ABDÊ HAC XELÎL da xwiyakirin û got" di van her du salên bûrî de wan gelek astngî dîtin ji ber nema yek rêxistin yên ku saziya alîkariya wan di peydakirina pêdiviyên çandinê, ne ji aliyê rijêma Sûryê û ne ji komîteyên Kurdî yên kû nu hatine demzirandin".

Herweha cotkarakî dî jî Girkê legê MISTEFA TEYIB ji kovara Welat re axift û got: di vê salê de me semad li zevîyê xwe ne reşand ji sedema giranbûna buhayê wê wek tê zanîn her tonek semada Buharî buhaya wê di bazara reş de bûye 110 hezar Sûrî û di salê bûrî de buhayê her tonek semad 16 hezar Sûrî bû, ji cotkar nayê ku vê semadê bi reşîyê û ev tişt tîkdariya mizîna tîne li ser zevîyan.

Cotkarên herêma neçar dimînin ku semadek nû bi kar bînin ew semad aviya her 5 Litir jî vê semadê roberê 4 Donim di reşîyê, lê ev semad cara yekmîne peyda di be li bazarê û cara yekmîne cotkar bi kar tînin ew nizanin ku ewê sîdar be an bi ziyana be bo zevîyên wan.

û kêmaniya baran barîyê di meha Nîsanê de bû cihê metirsîyê li gel cotkar û çandinî li zengilê bivîniyê lê dide.

Gotina cotkarên herêma Girkê legê" sal bi sal xwezî bi par", ma gelo cotkarên ku di salên bê de ewê bêjin xwezî bi bar ?!



Hunermend Reşîd Sofî

Amadekirin: Şêrîn Temo

Destpêk ûd bû û hîna jî ûd e:

Reşîd Sofî di sala 1953 an de li bajarê Kobanê ji dayik bû .

Têkiliya Reşîd bi muzîkê re di qonaxa amadekirinê jî xwendina wî ya dibistanê de destpê kir li gel amûra ûdê .

Reşîd Sofî li ber destên bavê xwe fêrî zanînên olî bû, belkî ji ber vê destpêkirina wî bi stranên sofî bû.

Piştî ku Reşîd bawernameya bekaloriya bidest xist berê xwe da welatê Misirê ,

Li Misirê Reşîd gelekî li ser muzîkê xwend û bawernameyeke şanazî ji Peymangeha Bilind ya Mûzîkê bidest xist.

Ta bi roja îro sê kasêtên Reşîd Sofî hene:

GULISTANA DIL

MEY NENOŞÊ

EVÎN

Gelek stranên Reşîd Sofî yên bi zimanê erebî hene, lê wî ew wek kasêt belav nekirine.

Reşîd Sofî awazdanerê hemû stranên xwe ye.

Reşîd Sofî awaz ji gelek helbestên Melayê Cizîrî re danîn û ew helbest gotin(stran).

Reşîd Sofî _li gor gotina wî _yekem awazdanere ku awazan ji helbestên helbestvanên ereb yên sofî (Ibn-el Farêd ,)re datîne, yek ji wan helbestan helbesta Zidnî.

Gelek caran Reşîd aheng bê beramberekî diravî (bê pere) li dar dixistin, ev jî , ji ber nêrîna wî ya ku dibêje;"bazirganî bi hunerê nabe, û yên ku pê bazirganiyê bikin , huner dê doznameyekê li wan rake".

Li gorî Reşîd Sofî hunera Kurdî di asteke nizm de ye, ev jî _weku Reşîd dibêje_ ji ber nezanîna hunermendê Kurd bi meqaman.

Reşîd Sofî hewl dide ku hunera Kurdî pêş bixîne û berhemine Kurdî ye nemir biafirîne .

Reşîd dibêje ; ne pêwîste ku hunera hunermend li gor kêfa xelkê tev be, ya pêwîst ewe ku xelk tev hesta xwe ya muzîkî bilind bike û bighîne asta hunera hêja.

Reşîd Sofî dibêje ku wî jehek (têlek) li ser jehên amûra ûdê zêde kirye û ev bû sedem ku ji alî televîzyona Sûriyê ve di sala 1993an were vexwendin.

Reşîd Sofî yê nivîskar û ekter:

Li gorî ku hunermend Reşîd Sofî dibêje du pirtûkên wî yên di warê muzîkê de ku bi zimanê erebî hene û ew jî : (Zimanê Muzîkê – Meqamên Rohhilatî) ne, lê Wezareta Çandî rêdanne nameya çapkirina wan neda ji ber ku navên hemû meqaman tê de bi zimanê Farisî û Kurdî ne û ji ber ku nivîskar(angor Reşîd Sofî) rola ereban di dîroka muzîkê de bibîr neanîye, ji xwe _weku Reşîd dibêje _xebateke mezin ya ereban di dîroka muzîkê de tineye, tevî ku Ereban pişt re gelekî afirand di warê muweşehat û helbestên stranî de.

Ezmûneke Reşîd Sofî di warê sînema de jî heye ew jî fîlma ku li gel derhênerê Frensî Can Frêdrêk çê kirî ya ku navê wê:(Şîyarîbûna Rebenekî dêrê) ye, Reşîd tê de rola rahênerekî muzîkî dilîze.

Reşîd Sofî weku hunermend kete bin bandora mezintirîn meqamzanên rojhilatî :(Mihemed Rîf'et - Mihemed EbulWehab -).

Nûyê hunermend Reşîd Sofî sê stran in :(Çavên yara min – Tu bi xêr hatî yara min – Evîn û dil û canê min).

Reşîd xwe di awazdanînê de dibîne bêtirî ku xwe di stranbêjiyê de dibîne , ev jî – weku ew dibêje – ji ber ku awazdanînê pêdiviya wê bi karînine mêtirî û afirandinine muzîkî heye .

Ev e .. eva ye Reşîd Sofî .. hunermendê mezin, awazdaner, nivîskar, û carekê ekter.

Reşîd Sofî gelek xizmet ji bo hunera Kurdî kir û ji dêvla wê xizmetê tenê navek qazinc kir, navekî ku di ezmanê hunera Kurdî de her diçirise. ■



Rêjeya zewacê li Efrînê 4 qatan zêde bûye

Efrîn -Welat

Piştî pêla koçkirinê ber bi herêma Efrînê ve ji destpêka şoreşa sûrî, ne bi tenê ji xelkên herêmê yên ku li Helebê an bajarên sûrî yên din yên mezin jiyan dikirin, lê ta bi bi xelkên ereb yên bajarê Helebê û gundewarê wê, zêdebûneke mezin di hejmara nişteciyên herêma Efrînê de çêbû.

Li gora amarên herî dawî bêtirî 600 hezar penaberî ber bi Herêma Efrînê û navçeyên wê koç kirine.

Tevî ku gelek bandorên neyînî yê vê koçkirinê li ser herêma Efrînê û samanên wê hebû, lê ev koçkirin bi hin

encamên erênî jî li ser herêmê vegeriya, û ew jî zêdebûn di rêjeya hevserîti angoyê zewacê de. Herî dawî dadgeha Gel li herêma Efrînê ragihand ku piştî pêla koçkirinê ber bi herêmê ve zêdebûnek ketiye rewşên zewacê de û ew gihaye çar qatî hember salên berê. Tevî ku berî gelek zehmetî diket riya xortan de di dema zewacê de lê têkçûna rewşa aborî ya herêmê hişt ku gelek ji adetên berê yên ku dibûn asteng di riya zewacê de ji holê rabin û di serî de meseleya qelenê giran ■



Melat

Hinar



Li nav me kurdan de belavîn . Dara hinarê li hemî cihan çî deşt an ciya be jiyan dike, di buharê de kulîlk didê u di dawîya havînê u destpêka payizê de maywa xwe dide , kulîlka wê pir xweşik û bedew e, ji ber vê yekê kurdan navê kulîla wê li keçên xwe kirine wek (Gulnar), hevdem Erebb , Tirk , Faris û Ewropî jî navê Gulnar ji keçan re bikar tînin , Erebb u Ewropî (Culenar) bi kar tînin .

Ciqilên dara Hinarê , kulîlk ,qaşûl , libên meywa wê u dendikê wê pir bi sûd in .

bijîşkê kevnar Îbin Sîna dibêje çiqilên dara hinarê li derdora xanî u malan gelek teba ,mîro,û sirsirkan dûr dixê u ji ber vê yekê hin teyîrik hene ku hêlîna xwe tenê ji ciqilkên dara hinarê ava dikin.

Feronî U Yonanî yê kevin qaşûla meywa hinarê bi awakî hûrkirî yan bi tenê yanî di nav hingiv de ji bo dermankirina birînên kul yê sistêma dahandinê , pîrzişkên nexweşîya xûrya u hemî

pîrzişkên kul yê çermê laşê mirov bi kar tanîn.

Li cem me kurda , ji bo zik êşê u jehrî yê , pîr hinar bi kar hatiye.

Meywa hinarê pir zengêne bi: vîtamîn C , vîtamîn B 5 , Omêga 5, polîfînol ,u tîrşîya pûnîsîk , yê ku wek antî aksîdantîn xurt tîn naskirin u parastina sistêma xwîngerê ji nexweşiyên dil u damara

Dendikê hinarê pir zengîn in bi tîrşîya pûnîsîk u omêga 5 û ev herdu kirîste pir bi sûd in ji bo nûkirina şaneyên çermê laşê mirov , donê dendikê hinarê ji bo bedewkirina dest u rûyê keç û jinan li Ewropa pir bi kar tê.



Jêder **Tenduristiya Gel**



Bila em stran bin...

Dixwazim ji Keleha dilê te çend tîpan bibim.
Dixwazim li ser keviya ruhniyê kenekî raxînim...
Derdê dûrbûna xwe li ser ewrên bazdayî bar bikim.
Bi ser xaka bîreweriyê de bila biçe û bibare bibare...
Evîne, wisa tu ji min dûr î...
Welatekî kelê me, bê nexş im,
bê stran im û bê buhar im...
Min ji rex dîlovaniya xwe der neke,
helbesta te ya sibehîn di buxçika gunehên xwe de digirînim.
Ew giriyê rûmeta çîrusîna stêran,
li ser rêka kadîzan û li asmanê te,
hinguvê kenê te, hevî û dilheyva rûgeş dibînim...
Seyrana hilmên min,
geşta dîtî û awirên min,
hey heyîna derfeta geşbîniya min...
Ji nû ve tu dê wênayê min birêsinî.
Ji nû ve tu dê ava kaniya xwe dar bi dar kunîleyên min av bidî...
Ez ê ji te re gulên xwe raxînim,
bila şanaziya pêyên te bi huhareke dildayî hebe...
Ji yadîgarên serdema dilêriyê em ê xezalên kenê xwe di çavên mest de biçêrinin.



Da bibêjin du kew li hêlîna xwe vedigerin.
Du dêliyên berhemdar goşiyên xwe ji rojê re diguhêzin.
Û bila em ew strana li ser lêvên Evdalê Zeynikê bin,
ko ji Gula dilê xwe re sotîna canên me bibêje û bibilîne...

Ezîz Xemcivîn

Bela hilma te ji me were

Dayê
Min dixwest ez ji tere bêjim:
Tu stêra defterên minî
Û ya dikare rahêje kulên hêsrên

Dayê
Min dixwest ez ji tere bêjim:
Tu sira sibehên nîsanê yî
Û nîsana her salekê ji temen e

Dayê
Min dixwest ez ji tere bêjim:
Ta ez û jiyan hebin
Ez dixwazim hilma te ji me were

Helbest Yûsiv



Reviyayî

ji himbêza tirsekê
ji awirên bajarekî zerhimî
û di rê de..
berî ku li giriyê xwe bilukme
di bin serê sinorekî tevîzî de
tembîniyên xwe yên jikoketî veşartin.

Gavên wî
yên teqînî di xavika peyvê de
peyvên ku di paşila helbesteke nemeyayî de
bavanên bendewariyê pîne dikirin.

Reviyayî
ji sirûda xwe
ji qada xwenê
xwenên ku di destê sibeheke reben de jidayik
dibûn.

Û ji nişkan ve
berî ku oxira xwe bidarve bike
rişma dengê xwe sist dikir
û ji mukrbûna xwe peya dibû:

Ez şahsiwarê êşa xwe me
tewanbarê binavkirina vê windabûnê me
û heyvanê şikestina xwe me,

lê hîn jî di gora kena xwe de
ez hestiyên dengê xwe cebar dikim
û keziyên sitrana xwe hine dikim.

Reviyayî
Ji pêçeka xwe
ji dergûşa xwewindakirinê
û hemî bendên ku di serê wî de dilîlandin,
malneketo
tu jî kê re
ji kîjan bêbextî re
vê çîrokê ditivtîvî
tu yê terqiyayî ji lehengiya xwe.

Reviyayî
ji dengvedana gavên xwe
ji pit- pita van rojên zexel
ka destê vê peyvê bigre
û were em bi hev re
weke du cêwiyan
termê vê helbestê binxumînin
bi korîma me be
em yên ku bidawî nabin. ■

Şepal Heyvo



Hêvî

Hêvî û xewn...
Di çîhrên çavên te de
windabûn...
ji ber çavên te..
ji hêvî û xwenan
dûrtirin...
vîn û evîn di daristana
porê te de..
avjeniyê dîkin..
û şepolan didin
kenarên dil...
axîn û kovan ..
konê xwe pecan
û barkirin ji dema
rûkê te yî berfîn
şewl da tariya min
lê ji hinya min te
nasî tu bû çivîkek
baskokirî û hêlîna xwe
li peravê kaniya
evîna min çêkir...
çêkir.....! ■

Hozanê Girkundê



شعراء عرب أنصفوا الكرد

في كتابه جكرخوين من عمق المأساة الى فضاء الإنسانية؛ أضاء الأستاذ حسن جنكو جوانب مهمة من حياة شاعرنا الكبير جكرخوين. هذه الجوانب التي كانت حقاً بحاجة الى المزيد من الإضاءة والدراسة المستفيضة.

لا شك أن الأستاذ حسن جنكو بذل جهداً مضمناً لإنجاز هذا العمل الأدبي الرائع وابتدع فيه؛ والذي زاد من ابداعه وجمالية عمله؛ هو اضافته واستشهاده بثلاثة أعمال أدبية لثلاثة شعراء عرب انصفوا الكرد هم بحق من عمالقة الشعراء العرب في العصر الحديث!

والشعراء الثلاثة هم: محمد مهدي الجواهري، محمود درويش، وأدونيس.

ففي لوحته الرائعة المهداة الى الشعب الكردي حيث يستعظم فيها تضحيات الكرد ويعبر عن تأييده لحقوقهم المشروعة يقول الجواهري:

قلبي لكردستان يهدي والفم
سلم على الجبل الأشم، وأهله
باسم الأمين المصطفى من أمّة
سلم على الجبل الأشم وعنده
سفر يضم المجد من اطرافه
يا موطن الأبطال بث مؤلم
يا أيها الجبل الأشم تجلّة
شعب دعائمه الجماجم والدم

ولقد وجود بأصغريه المعدم
ولأنت تعرف عن بنيّه من هم
بحياته عند التخاصم تقسم
من أبجديات الضحايا معجم
ألقاً كما ضم السبائك منجم
والذ أطراف الحديث المؤلم
ومقالّة هي و التجلة تؤأم
تتحطم الدنيا و لا يتحطم

هنا أريد أن أذكر أن الجواهري لم يخلع عن رأسه يوماً قبعته المطرزة باسم كردستان!

الشاعر الثاني هو شاعر المقاومة الفلسطينية محمود درويش، وهو يتعاطف مع الكرد

حيث يعانق جبال كردستان الشامخة ويتوحد مع صقور هذه الجبال التي كانت تتلقى الضربات المؤلمة من قوات الطغيان حيث يقول:

معكم قلوب الناس
لو طارت قذائف في الجبال
معكم عيون الناس
معكم أنا... أمي... أبي
وزيتوني وعطر البرتقال
معكم عواطفنا... قصائدنا

جنود في القتال

يا حارسين الشمس من أصفاد أشباه الرجال

ما مزقتنا الريح ان نضال أمتكم نضالي

ان خرّ منكم فارس شدّت على عنقي جبالي

هل خرّ مهرك يا صلاح الدين

هل هوت البيارق

هل سيفك صار مارق؟

في أرض كردستان

الليل يفتس الصباح

وحقول كردستان موسمها جراح

الحب ممنوع وهمس الجار .. لا شيء مباح

إلا دم الأكراد نفضت الموقدين

مصباح عارهم يموت الآخرين

وثالثهم أدونيس الذي تناول الشأن الكردي في مجموعته المعنونة ب(فضاء غبار الطلع) وفيها يقف على حملات الإبادة الجماعية بالسلاح الكيماوي وحملات الأنفال فيقول: يستطيع القصف الكيماوي أن يقتل كل شيء إلا الحب.

ثم مضى ويعزّي الواقع من رياء المؤرخين فيقول: أبجدية التاريخ مرابا مكسرة: قطع زجاج تستغيث- مرابا بعدد الكرد الذين أنفلهم الطغيان: مئة وثمانون ألف قطعة. في سقفه تتلأأ خمسة آلاف من المصابيح بعدد القتلى الذين خلفهم القصف الكيماوي. ثم يضيف: الكردي آخر لذات متعددة- عربية، تركية، فارسية (أذلك امتلاء أم فراغ؟) كل منها تحاول أن تنفيه. لكن أليس نفى الآخر نفياً للذات؟

هذه المواقف المشرفة لهؤلاء العمالقة ستبقى مبعث فخر واعتزاز وستبقى عالقة في أذهان الأجيال على مر العصور ولن يحوها ماح .

لقمان يوسف

القلق النفسي عند الطالب قبل الامتحان

بكلماتهم المشجعة لإحياء الثقة و التخلص من التوتر . ٥- عدم مراجعة المادة بعد الدخول إلى مركز الامتحان . ٦- التريث في قراءة السؤال و عدم قراءة الأسئلة دفعة واحدة . ٧- مراجعة ورقة الأسئلة قبل تسليمها . ٨- عدم الإلحاح على التذكير بالإجابة حين نسيانها و إفساح المجال للأسئلة الأخرى . ٩- التقيد بالوقت و عدم مغادرة القاعة بسرعة . و صفوة القول : فإننا نحصد في نهاية المطاف ما زرعناه فالإنسان هو الذي يصنع نفسه بنفسه ■

كمرة أيو

حيث يحبوا الحلم ليقترّب من الواقع , تتسارع مئات الهواجس لتضطدم بعضها فيبدأ الجدل الذي لا يراه أحد ولا يسمعه أحد سوى الشخص نفسه , أأكون قادراً على تجاوز هذه الأزمة , هل سأستطيع تجاوز هذا الاختبار الصعب و أثبت نفسي أمام العالم بأجمعه بأنني قادر على فعل كل ما أريد . هي تساؤلات كثيرة يراود الطالب قبل الامتحان لأسباب كثيرة منها ما يكون القلق على المصير المجهول أو الدوافع المتصارعة بين رغبات الأهل و رغبات الطالب أو ربما الصراع بين ما يحققه الطالب في الواقع و ما يطمح إليه و قد يكون بسبب فروقات في نسبة الذكاء بين الطلاب يقتضي الشعور بالنقص بالنسبة للآخرين أو لربما بسبب الوضع المادي المتردي و العمل الإضافي بعد المدرسة لمساعدة الأهل ولا سيما الذكور في حين تكون المشاكل العائلية لها دور كبير فعلى سبيل المثال الوضع الثقافي العائلي و نسبة الاهتمام بالتعليم و التعلم ,بالإضافة إلى فقدان أحد الأبوين و تسليم الطالب ولا سيما الأكبر المسؤولية أو بسبب عدم وجود جو مهيب للدراسة منذ بداية العام الدراسي فجميع هذه الأسباب تؤدي إلى القلق و عدم الثقة بالنفس لدى الطالب . لذلك نسعى جاهدين مع كثير من الأمل في إيجاد الخطوات التي ستساعد الطالب للتخلص من هذا الاضطراب و الذي يتجلى بـ : ١- النوم الكافي أثناء الامتحان ٢- تناول الفطور قبل الذهاب إلى الامتحان ٣- ممارسة الرياضة خلال (٥) دقائق في الصباح . ٤- مساندة الأهل للطالب



بقعة ضوء على جرائم الشرف

وإذا ما أجرينا مقارنة بين عادات وتقاليد مجتمعاتنا وعادات وتقاليد المجتمعات المتطورة نجد بأن هناك فروق واختلافات واسعة بينهما تصل بعضها إلى حد التناقض .. ففي الوقت الذي نجد فيه بأن بعض الرغبات كالممارسة الجنسية والعلاقات العاطفية لديهم تعتبر من حقوق الإنسان الطبيعية والاعتيادية ومن خصوصياتهم الشخصية التي يمنع التدخل فيها وتضان قانونيا ولا يوجد أي حرج في ذلك على عكس المجتمعات الشرقية فذلك يعتبر خرقا للمحرم والمقدس ويستحق اشد العقوبات.

فنحن هنا لا ندعي بأن الإباحية في العلاقات العاطفية ستحرر الشعوب من قيم التخلف و الجهل فهناك معايير وحقوق ومعتقدات كثيرة يجب تجاوزها ليتم الارتقاء بالشعوب وإغا المقصود هنا أن كرامة الإنسان وشرفه لا يتعلق بعلاقة عاطفية أو بجسد امرأة وإنما الشرف والكرامة يتمثل فيما يقدمه الفرد لمجتمعه من إنجازات سواء من الناحية الاجتماعية أو الاقتصادية أو الثقافية أو غيرها من الانجازات... ومن جهة أخرى فإذا ما نظرنا من الناحية الحقوقية إلى وضع الرجل في المجتمعات الشرقية بشكل عام نجد أيضاً تناقضاً غريباً وازدواجية في المعايير بين ما يطبق بحق الرجل وبحق المرأة فيما يتعلق بهذه الأمور، حيث يتيح للرجل ضمن العقائد والشرائع العديد من الأمور فيسمح له بالزواج من - مثنى وثلاث ورباع - وبزواج المتعة والمسيار - ولا يعتبر كل ذلك زنا وعار يستحق القتل والرجم، وحتى أن اعتبرنا أن تنفيذ جرائم الشرف يكون تطبيقاً للشرعية الإسلامية فنجد بأن المرأة هي الوحيدة التي تحاسب على الخطيئة دون الرجل.

وفي ختام هذه السطور نجد بأن هذه الإشكالية لن تحل إلا عبر عقد اجتماعي يتفق عليه الجميع و يضع من خلاله حداً لجرائم القتل البشعة .. ويلغي هذا العقد مفهوم الشرف السائد الذي وضع حصراً في جسد المرأة والعمل لتبديله بشرف يمنح كوسام إلى كل من ينجز إنجازاً علمياً أو حقوقياً أو سياسياً أو فنياً أو ثقافياً يخدم تطور الشعوب ويساهم في ازدهارها وتقدمها.

ترتكب سنوياً العديد من الجرائم في المنطقة بحق المرأة تحت طائلة ما يسمى بجرائم الشرف أو غسل العار وذلك في إطار من العادات والتقاليد السائدة المتعلقة بالزواج والنواحي العاطفية، وهذا العرف منتشر في معظم الدول المجاورة وموجود بكثرة في بعض أقاليم كردستان.

فهذه المجتمعات كما هو معروف تقوم من خلال عاداتها المتداولة وقيمها السلوكية بارتباط شرف العائلة وكرامتها بجسد المرأة ويعتبر أي ملامسة لهذا الجسد خارج القوانين والأعراف المتبعة في الزواج جريمة يعاقب عليها، حيث تقول الدكتورة «نوال السعداوي» في هذا الصدد « أن شرف المرأة وشرف عائلتها ضمن هذه المجتمعات ترتبط بكرة المرأة وعفافها » لذا فأى اختراق في هذا الجانب خارج المنظومة الزوجية يؤدي إلى قتل المرأة أو تنعت بأشد العبارات قساوة تلامس بشكل مباشر شرفها وكرامتها الإنسانية وكرامة أهلها وتبقى في نظر المجتمع غير أخلاقية وعاهرة مدى الحياة .

ولتفادي هذه العقوبة القاسية تلجئ عائلة المرأة إلى قتلها لغسل هذا العار أي يمكن القول بأن هذه الجريمة ترتكب تحت ضغط العادات والقيم الاجتماعية السائدة لتفادي وصمة العار التي تتمخض عن هذه الممارسة...

وحتى في حالات الاغتصاب تبقى المرأة منبوذة في المجتمع ولا يرغب أحداً بها ولا يهم أن حدث ذلك بإرادتها أولاً فقد تم لمسها من قبل آخرين وستبقى عالة على أهلها وفي أغلب الأحيان يتم تزويجها بكهل أرمل للتخلص من مسؤوليتها والتخلص من العار الذي ألحق بالعائلة، و أن نظرنا إلى وضع المرأة المطلقة فهي أيضاً تواجه نفس المصير حيث تكون منبوذة وليس لديها أي مستقبل يذكر فقد كانت زوجة أحدهم قبل الآن وتم لمسها وهذا ما لا يتقبله المجتمع وتبقى مصدر خجل لعائلتها.

نوفين مرعي



PEYVA WENDAYÎ

Peyva wendayî ji 5 tîpa ye , navê hunermendekî Kurd e, ji Parêzgeha Qamişlo ye .

Dar-zevî-ez-şîlan-tu-
can-celadet-do-nalîn-
dûr-ferat-navnîşan-
buhar-xalo-roza-dev-
şîn-xav-cubar-zara-
sor-av

D	N	A	V	N	Î	Ş	A	N	Ş
O	F	E	R	A	T	D	Û	R	R
C	E	C	A	N	Y	T	U	A	O
E	N	Ş	Î	L	A	N	H	L	A
L	A	R	D	A	R	U	A	Z	V
A	L	A	Z	Z	B	X	O	E	N
D	Î	B	A	E	Ş	R	D	Î	V
E	N	U	R	V	O	A	Ş	A	Z
T	D	C	A	Î	R	V	X	E	A

--	--	--	--	--

Jimara bi tenê

Cihê vala di her malikê de bi jimara gerek dagre, lê divê ku tenê carekê jimar were dagrtin di her malekê de, û herweha divê ku tenê carekê were dagrtin li ser xêza asoyî û serjêr .

8				4			3	
				7		4		9
	5			9	3	6		8
6	1			3		9	7	5
7		5					2	3
	2	8					4	6
	8		7	6	5			
		6	3		9	7	8	1
	7	3		8	4			2

XAÇERÊZ

Rast:

- 1-bajarekî Kurdî ye li Bakur.
- 2-gotina (dibe-başê)bi zimanê Ingilîzî-kesên oldar ku pir navdarin bi koka xwe ya oldarî.
- 3-kenalek asmanî,Kurdî ye.
- 4-hedan û aram.
- 5-nisrîn (bela wela).
- 6-çar tîp ji gotina Şeydabûn – birayê bav .
- 7-terse gotina wêran – navekî lawan e .
- 8-navekî lawan e .

Serjêr:

- 1-yek ji renga ye – tersê ewr (b).
- 2-li ku derê (b) – «ev» li gorî zaravoka Duhokîyan .
- 3-bajarekî Kurdî ye li Bakur.
- 4-hêvî.
- 5-bûyerên rastûxo – tersê gotina şite.
- 6-dera sazkirina rahigandinê – agir.
- 7-sê tîpên pêşî ji navê Kawîs Axa – cih (b).
- 8-gotina Kurdî ya li hemberî «Mersî» ya Ferensî.

	1	2	3	4	5	6	7	8
1								
2								
3								
4								
5								
6								
7								
8								

Pend û şîretên Kurdî

- 1-Barê xwe li piştê şikestî neke!
- 2-Mal têrê,kebanî jîr û şêre !
- 3- Bila bi dax be, û li ser vî destê sax be !
- 4-Êş bi roj dihere li ser kaşa, û bi şev vedgere laşa !
- 5-Hêka îro bi mirîşka sibe nede!

Ferhengok

- تسارُع Tawdan
تسامح Lêbordin
تسامي Berzbûn
تساهل Asan karî
تساوي Yek sane
تشجير Dar danîn
تشجيع Handan
تشریع Yasa danîn
تشهير Nav zirandin
تشويه Şêwandin
تشنج Kirjbûn
تقسخ Rizîn
تقسیر Rave kirin
تفكك Helweşandin
تفنن Huner karî



WELAT FM...dengê welatê meye



welat.press@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



العدد (١١) ٢٠١٤/٦/١